



## Book Review

International Journal of Kurdish Studies

9 (1), pp. 55-70

<http://www.ijoks.com>

### Ji Aliyê Rêbaz û Etîka Zanistî ve Rexneyek li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmanciyê<sup>1</sup>

Necat KESKÎN<sup>2</sup> 

Received: Jan 14, 2023

Reviewed: Jan 19, 2022

Accepted: Jan 23, 2023

#### Kurte

Rêbaz û pabendî bi etîka zanistî ji bo her xebatekê du xalên herî girîng in. Ev her du xal in ku xebatekê serkeftî an jî qels dikin.

Ev nivîs jî di vê çarçoveyê de nixandineke li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmanciyê ye ku ji aliyê Weqfa Mezopotamyayê ve di Kanûna Pêşîn a 2019an de hatiye çapkirin. Ji pirtûkê tê famkirin ku ev Rêber encama çend salan ya Komxebata Kurmanciyê ye û bi beşdarbûna 20 kesan hatiye amadekirin. Ligel ku di maweya çend salan de hatiye amadekirin jî, tê dîtin ku xebat û Rêbera hatiye amadekirin ji aliyê rêbaz û etîka zanistî ve xwedî pirsgirêkên cidî ne. Lewma di vê nivîsê de pirsgirêkên metodolojîk û etîka zanistî yê Rêberê û amadekirina wê hatine nixandin.

**Peyvên sereke:** Kurdî, Rêbera Rastnivîsînê, Komxebata Kurmanciyê, Rêbaz, Etîka Zanistî

#### Recommended citation:

Keskin, N. (2023). Ji Aliyê Rêbaz û Etîka Zanistî ve Rexneyek li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmanciyê. *International Journal of Kurdish Studies* 9 (1), 55-70,

DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1234239>

<sup>1</sup> Komxebata Kurmanciyê (2019). Rêbera Rastnivîsînê. Çapa yekem. Weqfa Mezopotamya: Diyarbekir

<sup>2</sup> Assoc. Prof. Dr., Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages, Department of Kurdish Language and Culture, e-mail: [necatkeskin@artuklu.edu.tr](mailto:necatkeskin@artuklu.edu.tr)

ORCID: <https://orcid.org/0000-0003-0884-1309>

## **A Critique of the *Kurdish Working Group's Writing Guide* in Terms of Methodology and Scientific Ethics**

### **Abstract**

Methodology and adherence to scientific ethics are the two most important points for any work. These are the two points that make a work successful or weak.

This article, in this framework, is a review of the *Kurdish Working Group's Writing Guide* published by the *Mesopotamia Foundation* in December 2019. It is understood from the book that this *Guide* is the result of several years of the *Kurmanci Working Group's* work and was prepared with the participation of 20 academics / academically affiliated people. Although it has been prepared for several years, it can be seen that the work and the prepared *Guide* have serious problems in terms of scientific methods and ethics. Therefore, methodological problems and scientific ethics of the *Guide* and its preparation process have been evaluated in this article.

**Keywords:** Kurdish, Spelling Guide, Kurdish Working Group, Methodology, Scientific Ethics

## **Metodoloji ve Bilimsel Etik Açısından Kürtçe Çalışma Grubu'nun Yazım Klavuzu Üzerine Bir Eleştiri**

### **Öz**

Metodoloji ve bilimsel etiğe bağlılık, herhangi bir çalışma için en önemli iki noktadır. Söz konusu çalışmayı başarılı ya da zayıf yapan da bu iki noktadır.

Bu çerçevede, bu makale de Mezopotamya Vakfı tarafından Aralık 2019'da yayınlanan *Kürtçe Çalışma Grubu (Komxebata Kurmanciyê) Yazım Kılavuzu'nun (Rêbera Rastnivîsînê)* bir incelemesidir. Bu Kılavuzun *Kurmanci Çalışma Grubu'nun* birkaç yıllık çalışmalarının sonucu olduğu ve akademisyen/ akademi ile ilişkili 20 kişinin katılımıyla hazırlandığı kitaptan anlaşılmaktadır. Birkaç yıldır hazırlanmış olmasına rağmen, çalışmanın ve hazırlanan *Kılavuz'un* bilimsel yöntem ve etik açısından ciddi sorunları olduğu görülmektedir. Bu nedenle bu makalede *Kılavuz'un* ve hazırlanma sürecinin içinde var olduğu düşünülen metodolojik ve bilimsel etik ile ilişkili sorunlar değerlendirilmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Kürtçe, Yazım Klavuzu, Kürtçe Çalışma Grubu, Metodoloji, Bilimsel Etik

## Destpêk

Ev kurte-gotar/rexne wek ku ji sernav jî diyar dibe derbarê *Rêbera Rastnivîsînê*<sup>3</sup> ye ku ji aliyê *Weqfa Mezopotamyayê* ve di Kanûna Pêşîn ya 2019an de hatiye çapkirin. Ji wê demê heya niha wext di ser re derbas bûye lê hîna jî li ser niqaş dibin, rexne lê tîn kirin an jî tê nirxandin. Ev nivîsa berdest jî ji vî alî ve rexneyeke derengmayî ye.<sup>4</sup> Lê aliyekî vê derengmayîne yê pozîtîf jî heye li gorî min ku ew jî derfetê dide mirov ji bo çavdêrî û pijîna fikir. Di encamê de ev nivîs derket meydanê ku dikare wek “şerh”eke ji bo vê *Rêbera* navborî jî bê nirxandin. “Şerh”eke derbarê rêbaza komxebatê û aliyê etîka zanistî ya nivîsandina *Rêberê*. Ji ber ku ev her du xal jî ji bo xebatekê pir girîng in.

Di vê maweya çavdêrî û pijîna fikir de herweha bala min li ser bû bê ka kî, li kû, çawa vê *Rêberê* bi kar tînin; bikaranîna wê motîvasyonêke çawa derxistiye meydanê? Gelo bi rastî pêdiviyek bi vê *rastnivîsînê* hebû? Gelo ya/yên ku heta niha me bi kar dianî/n tîra me nedikir/in? Gelo tez, proje û gotarên ku bi “ya din” hatibûn çapkirin û weşandin kêma zêde konsensûsek ava nekiribû? Çima me berê xwe ji vê lihevkerina xwezayî dida dereke din? Dîsa di çarçoveya vê mijara zimên de, gelo çima kurd dixwazin xwe ji tradîsyonên heyî dûr bixin? Gelo çima divê her dem dîsa û careke din ji “sifir”ê dest pê bikin?

Ji hêla din ve ji bilî rexneyên li ser *Rêberê* yên di nav danûstandin û axaftinên rûbirû; yên dûvdirêj ku hatine weşandin jî motîvasyonê nivîsandina vê kurte-gotarê geştir kir. Di nav van rexneyan de ya herî balkêş jî “daxuyanî”ya Deham Ebdulfettah bû ku hem endamê komxebatê bû û hem jî navê wî li ser halê “çapkirî” yê *Rêberê* jî hatibû nivîsandin.<sup>5</sup> Ev mînak bi tena serê xwe pîrsgirêka “etîk” û “metodolojiya” komxebatê/*Rêberê* derdixe holê ku mijara vê kurte-gotar/rexneyê ye jî.

<sup>3</sup> Ji vir û pê de di metnê de dê *Rêber* bê bikaranîn.

<sup>4</sup> Yek ji sedemên vê derengmayîne jî endîşeya şaşfamkirîne bû û ew endîşe hîna berdeham e. Ji ber ku mijara “etîka nivîsê” bi giştî mijareke hesas e û di nav *akademiya kurdî* de jî ev mijar tê *axivîn*, lê *zêde* nayê *nivîsandin*. (ji bo mînaeke nivîsandî bnr. Alan,2019). Lewma jî berî ku biryara belavkirîne bê dayîn bi hinek hevalan re ev nivîs hat parvekirin ku nêrînen xwe li ser bibêjin. Herçiqasî di ser van şandîyan re wextekî dirêj derbas bû jî tu bersivên van şandîyan –ên nivîskî- nehatin. Wekî ku bi awayekî nedixwestin tevî vê mijara *hesas* bibin. Lê li gorî min akademî dikare encax bi rexneyên wisa *hişk* pêş ve biçe û niha pêwîstiya akademîya kurdî jî bi vê heye. Ev rexne ne qedrê saziyan kêma dîke û ne jî keda xebatan piçûk dîke. Ji aliyê din çend xwendekarên min û hevalên din ku min ev nivîs bi wan re parve kiribû ew cesaret dan min ku ez vê nivîsê belav bikim. Li vir ez careke din spasiya wan dikim.

<sup>5</sup> Bnr. <http://portal.netewe.com/daxuyaniyek-di-derbare-rebera-rastnivisine-da/?fbclid=IwAR0LpAfo4Caojg9M8bw1nGH82myLR1HNYCt6JId3DXpZuPHkgkKZUKb8sLQ> (Lênêrîna dawî: 26.07.2022).

Li aliyê din, li gorî çavdêriyan dikare bê gotin ku hejmara rexneyên hatine weşandin li gorî nîqaş û rexneyên derbarê *Rêberê* ku di civatan de tên kirin hindiktir in. Bi ya min ya balkêştir jî kêmbûna rexne an nirxandinên ji “akademi”ya kurdî ye.<sup>6</sup> Ji bilî nirxandineke erênî (Aydın 2020) di kovarên kurdî yê akademîk de tu rexne an nirxandinên derbarê *Rêberê* xuya nabin ku ew bixwe wek pirsgirêkeke akademiya kurdî ya li Tirkîyeyê ye.<sup>7</sup> Ligel ku ev *Rêber* di hinek kovaran de nayê bikaranîn, dîsa jî nirxandinek xuya nake. Ango, an qebûlkirineke bêîtîraz heye an jî “hayjênebûn”ek!<sup>8</sup>

Wek mînak, tenê kovara *Folklor û Ziman* ku di heman demê de di bin banê *Weqfa Mezopotamyayê* de derdikeve, “nivîsandina li gorî *Rêberê*”ê di nav “rêgezên nivîsandin”ên kovarê de aşkere diyar kiriye.<sup>9</sup> Ji bilî wê, xuya dibe ku kovarên din hem gotarên li gorî *Rêberê* hatine nivîsandin û hem yê din jî qebûl dikin û diweşînin. Ev jî bêguman bi xwe re tevliheviyekê derdixe meydanê.

Piraniya rexneyên heyî li ser malper an jî “blog”an hatine weşandin. Yusuf Eroğlu (2019/2020), Halil Aktuğ (2017), Husein Muhammed (2020) û Qasimê Xelîlî (2020) bi nivîsên dirêj û bi awayekî hûrgilî rexneyên xwe yê derbarê *Rêberê* anîne ziman. Rexneyên Ergin Öpengin (2017) yê derbarê *Rêbera Rastnivîsînê* ya Mustafa Aydoğan (2012) jî dikarin di çarçoveya van rexneyan de bî qebûlkirin ji ber ku ya *Weqfê* jî li ser bîngeha ya Mustafa Aydoğan hatiye amadekirin!. Ji bilî rexneyên derbarê rastnivîsê ku wek “ferzkirin” (Muhammed 2020) û “otorîterî”yê (Eroğlu 2020) jî hatine nirxandin, rexneyên derbarê rêbaza xebatê jî di van nivîsên navborî de hene. Husein Muhammed rexneyên xwe bi giştî di çarçoveya “ferzkirin” û “hîperkorektî”yê de tîne ziman. Li gorî Muhammed pirsgirêka mezin ya *Rêberê* hewldana wê ya çêkirina zimanekî rasttir, anga hîperkorektî ye;

Pirsgirêka mezin ya *Rêberê* ew e ku ew hewl dide zimanekî ji zimanê piraniya kurdînivîsan “rasttir” çêke. Di zimannasiyê de navê vê diyarde û fenomenê “hîperkorektî” anga zêderastî yan “rastiya ji rastiye zêdetir” e ku ji guhnedana kûr ya zimanî tê (zimannas.wordpress.com, 2020).

<sup>6</sup> Li vir mebest “akademiya kurdî” ya Tirkîyeyê anga Bakûr e.

<sup>7</sup> Piştî ku ev nivîsa berdest bi dawî bû ez rastî xebata Orak-Reşitoğlu (2022) hatim. Di gotarê de *Kovara Hawarê û Rêbera Rastnivîsînê* ya Komxebata Kurmanciyê ji aliyê rastnivîsê ve hatiye berawirdkirin. Kêmasiya gotarê ew e ku qet behsa xebatên din ên derbarê rastnivîsê nehatiye kirin û wek nav jî derbas nabin.

<sup>8</sup> Di maweya du salan de di kovarên akademîk yê kurdî de (Journal of Mesopotamian studies, IJOKS, Nûbihar, Kurdîname, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi) derbarê *Rêberê* de tenê nirxandina Tahirhan Aydın ya di kovara *Kurdînameyê* de xuya dibe. Bnr. <https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiname/issue/57977/833215>

<sup>9</sup> Bnr. <https://dergipark.org.tr/tr/pub/folklorziman/writing-rules> (Lênerîna dawî: 26.07.2022).

Heman rexne ji hêla Öpengin ve (2017) li ser xebata Mustafa Aydoğan jî hatibû kirin. Wekî din Eroğlu di nivîsa xwe ya pêşî de (2019) rêbaz û “ziman”ê *Rêberê* û herweha hinek pirsgirêkên rastnivîsê jî rexne dike. Sernavê nivîsa duyemîn ya Eroğlu (2020) jî *Rastnivîsîn (?) : Otorîte yan otorîterî* ye. Ev nivîs dikare wek “reddiye” yeke *Rêberê* jî bê xwendin ku dibêje “Bila ji wan re oxir be. Bila Rastnivîsîn a wan be, rastnivîs têra me dike”.<sup>10</sup> Wekî din rexneyên ji “hundir” jî wek mînak yê Deham Ebdulfettah û Dilawer Zeraq jî balkêş in.

Lewma divê bê gotin ku hinek pirs û rexneyên di wan nivîsan de hatine îfadekirin dibe ku di vê metna berdest de jî cih bigirin. Lê ev nivîs an jî rexne wekî li jorê jî hatibû îfadekirin ji rastnivîsê bêhtir dê li ser metodolojiya Komxebatê/*Rêberê* û aliyê “etîka zanistî” ya *Rêberê* bisekine. Ji ber ku ji bo her xebatê û bi taybetî jî xebateke akademîk an jî xebateke ku ji hêla kesên xwedî pileyên akademîk ve hatibe nivîsandin du xalên girîng hene; *Rêbaz û pabendî bi rêgezên etîk ên zanistî*.

*Akademiya kurdî* ya li Tirkîyeyê hîna di asta destpêkê de ye<sup>11</sup> û lewma jî niqaşên li ser mijarên wisa hîna gelekî kêr in. Ji ber vê yekê armanceke vê rexne-gotarê jî ew e ku balê bikişîne ser vî aliyê xebatên kurdî û rê li ber nirxandinên li ser vê mijara hesas veke.

### Ji aliyê rêbazê ve xebat

Şeweyên curbicur ên nivîsandina pirtûk û gotaran hene û her yek jî di nav xwe de, li gorî xwe bi “rêbaz”ekê tê nivîsandin ku girêdayî xwendin, nêrîn û paşxaneyê nivîskar e. Lê eger xebatek ji hêla kesên xwedî pileyên akademîk ve hatibe nivîsandin, bêşik ji wê xebatê tê hêvîkirin ku ew xebat bi rêbazeke zanistî û di çarçoveyê zanistî de hatibe kirin û weşandin. Xebata bi navê *Rêbera Rastnivîsînê* ku mijara vê nivîsê ye jî ji hêla kesên xwedî pileyên akademîk û xwedî sîfêten têkildarî qadekê, wekî “zimannas” ve hatiye amadekirin. Lewma jî dê rexne ji aliyê vê “rêbaza zanistî” ve bîn kirin.

<sup>10</sup> Herçiqasî Eroğlu di nivîsa xwe de “otorîterî”yê rexne bike jî, îfadeyên ku bi kar tîne jî wek “otorîterî”yeke din xuya dikin, wek “...Lê em destûr nadin ew ziman xira bikin. Bila ji şaştiya xwe vegezin. Bila nebin kelem, nebin sedemê tevliheviyê.” Eroğlu di dawiya nivîsê de jî berê rexneyên xwe dide Zanîngeha Artukluyê [mebest beşên Kurdî yê Artukluyê ne!] ku bi ya min ji mebesta sereke ya nivîsê bi tevahî dûr ketiye! Ev mijareke din a niqaşê ye û derveyî çarçoveya vê nivîsê ye, lê bi kurtasî divê bê gotin ku Zanîngeh ne ew mekanên yekdeng in. Wekî din tawanbarkirina bêbingeh (bêyî referans, çavkanî!) û rexne ne heman tişt in!

<sup>11</sup> Li cihêkî din *akademiya kurdî* ya li Tirkîyeyê û pirsgirêkên wê hatine nirxandin. Herçiqasî hinek dem di ser wan nirxandinan re derbas bûbe jî dikare bê gotin ku rewş û pirsgirêkên akademiya kurdî hîna jî bi heman rengî berdewam in. Ji bo vê xebatê bnr. Keskin (2018).

Mirov dikare di seriyê pêşî de ji “komxebat”ê, avakirina komxebatê dest pê bike. Ji ber ku ev yek bi serê xwe pirsgirêkeke mezin e û di xebatê de jî nehatiye ravekirin. Hinek pirs dê mebesta me diyar bikin?

- Ev komxebat çawa, bi çi rengî, li gorî kîjan esasan hatiye avakirin? Kesên di nav de cih digirin li ser kîjan esasan hatine bijartin? Kê an jî kîjan lijneyan ev nav bijartine? “Standart” di vê bijartinê de çi bûne?<sup>12</sup> Komxebat çima bi 18 kesan hatiye sîordarkirin? Temsîliyeta van kesan a tevahiyê çi ye?<sup>13</sup>

Derbarê mijara “temsîliyet”ê, Bahoz Baran, yek ji endamê komxebatê, di hevpeyvîneke xwe de wisa dibêje; “Pisporên me yê Komxebata Kurmancîyê temsîla her çar parçeyan û temsîla derveyî welatî jî dikin.”<sup>14</sup> Gelo nîşankirina vê temsîliyetê li gorî çi ye? Gava mirov xebateke sehayî bike dikare bibêje “ez ê ji %10ê tevahiyê bistînim ku temsîla giştî ya sehaya min bikin?”. Gelo ev xebateke bi vî rengî ye? Ev xal di Rêberê de nehatiye ravekirin û lewma jî ev pirsên me bêbersiv dimînin.

Li aliyê din, gava mirov li rewşa xebat û tevgerên derbarê kurmancî yê îroyîn tenê binêre (ne pirsgirêkên polîtîk û zimanî) bêbingehbûna vê îdîayê aşkere dibe. Tenê li Tirkiyeyê, hebûna beşên ziman, çand û edebiyata kurdî; hejmara kesên ku di van beşan de masterên xwe kirine, tezên xwe parastine; kovarên akademîk, ên nîv-akademîk, ên popûler;<sup>15</sup> xebatên hatine çapkirin û tîn çapkirin; nivîskar û xwînerên van xebatan û di serî de jî hebûna weşanxaneyên kurdî (ku di nav wan de *Nûbihar* zêdeyî 30 salî û *Avesta* zêdeyî 25 salî xebatan diweşîne)<sup>16</sup> vê îdîaya jorîn bêbingeh dihêle! Lewma dikare bê gotin ku bi tu awayî ev “komxebat” temsîla tevahiya “qada” kurmancî û xebatkarên wê nake.

<sup>12</sup> Ji bo ku xelet neye famkirin divê bê gotin; li vir rexne ne li şexsan bixwe ye; gotin ne li ser kesayetî û berhem û xebatên wan ên takekesî ye; mebest li vir tenê “rêbaz”a avakirin û pêkanîn an jî nepêkanîna wê ye; ango gotin li ser hebûn û nebûna *rêbazê* ye.

<sup>13</sup> Ev mijar di rexneya Qasimê Xelîlî de jî cih digire û wekî tîne ziman temsîla “Colemerg, Serhed, Qafqasya” di komxebatê de cih nagire. Herweha temsîla herêmên wekî Mereş, Efrîn, Sewas, Meletî jî dîsa di vê komxebatê de tune ye.

<sup>14</sup> Bnr. <https://krd.riataza.com/2019/04/15/der-bare-rebera-rastnivisine-de/> (lênerîna dawî: 26.07.2022).

<sup>15</sup> Hebûna van beş û kovaran kêr, zêde; qenc, xerab li Tirkiyeyê akademiyeke kurdî ava kiriye. Ev beş û kovar ji her alî ve dikarin bî rexnekirin û niqaş derbarê wan de dikarin bî kirin û tîn kirin jî; lê mirov nikarê derbarê wan xwe li nedîtîne deyin!

<sup>16</sup> Bêguman li Tirkiyeyê weşanxaneyên din jî hene ku bi kurdî/ derbarê kurdî-kurdan de weşanan çap dikin; lê di nav wan de yê herî temendirêj ku îro jî karê xwe dewam dikin *Nûbihar* û *Avesta* ne. Mebesta dayîna navên van weşanxaneyan ev e.

Dîsa eger em bi pirsgirêkên sazkirina komxebatê dewam bikin;

- Li gorî nav û pileyên kesên di komxebatê de cih digirin, tê dîtîn ku pileya herî bilind a akademîk ji bo kesên di komxebatê de cih girtine pileya doktoriyê (Dr.) ye û pê re jî “zimannas” wekî sifetên hinek kesan hatiye nivîsandin (careke din, rexne tu car ne li kes û kesayetiye ye!). Gelo tu profesorek tune ye di qada kurdî/kurmancî de? Gelo ev kar tenê karê “zimannas”an e?<sup>17</sup> Sosyolojiya “ziman”; antropolojiya ziman; felsefeya ziman û hinek qadên din ên têkildarî ziman divê di nav karekî wisa de cih negirin gelo? Bêyî van qadan xebateke wisa “berfireh” dikare bê kirin?

Lewma li gorî van xal û pirsên jorîn dikare bê gotin ku sazkirina komxebateke bi vî rengî ji aliyê rêbazê ve ne rast e û ne di çarçoveyeke zanistî de ye. Wekî ku hatiye îdîakirin temsîliyetê wê ya wisa berfireh jî xuya nabe. Beriya sazkirina komxebateke wisa, kongre, sempozyum an jî komxebatên cuda bihatana lidarxistin, dibûya ku komiyonên cuda derketana meydanê ku qet nebe pirsgirêka “temsîliyet”ê berteraf bikira.

Ji aliyê din ve, xebateke ku ji hêla lijneyeke xwedî pileyên akademîk ve hatiye amadekirin divê xwedî “rêbaz”ê hundiirîn be jî. Ji hemû xebatên “lêkolîn”ê ev yek tê hêvîkirin, lê bi taybetî ji bo xebatên “zanistî” ev meseleya bivê-nevê ye. Lewma, divê berî her tiştî bersiva hinek pirsên sereke bê dayîn, weki;<sup>18</sup>

Ev xebat çima, ji bo çi, li ku, çawa hatiye kirin? Pêwîstiya xebatê û pêdiviya bi xebatê çi ye? Çarçove û sînorên xebatê çi ne? Ya herî girîng jî li ser kîjan daneyan ev xebat hatiye birêvebirin? Ev pirs di destpêka xebatekê de divê bîn ravekirin. Lêbelê gava mirov li *Rêberê* dinêre, dibîne ku ev xal gelekî lawaz û bêbersiv mane. Rast e, bersivên hinek ji van pirsan bi kurtî û di serê di xebatê de hene; wekî li ku (di bin banê Weqfa Mezopotamyayê de, li çar bajaran!), armanc (sazkirina standarta rastnivîsa kurmancî), çawa (bi rêya heft civînan)? Lê ya girîng “pêwîstiya xebateke wisa” û “pêdivîbûna xebatê” bi zelalî nehatiye ravekirin û ya heyî jî ne qanehker e. Jixwe berî her tiştî xebatek divê di seriyê pêşî de ji van hêlan ve qanehker be da ku qet nebe ji aliyê rêbaz û etîkê ve serkeftî bê pejirandin.

<sup>17</sup> Çawa, bo çi, li ser bingeha kîjan xebat an jî formasyonên “zimannasî”yê mirov dibe “zimannas”, bixwe mijareke sereke ye bo niqaşkirinê, lê cihê vê niqaşê jî ne ev der e.

<sup>18</sup> Hinek ji van pirsan rasterast an bi awayekî şiroveyî dibe ku di nav rexneyên din ên derbarê *Reberê* de jî cih bigirin, lê wekî hat gotin ew rexne bêhtir li ser mînakên xebatê bûn û ya me bi taybetî li ser “rêbaz”ê disekine. Lewma herçiqasî wek ev pirs an şirove wek “dubare” bîn xuyakirin jî ji vî alî ve ji wan cuda dibe.

Bêguman di vir de mijara herî girîng derbarê “pêwîstî û pêdivîbûn”ê, danasîn û ravekirina “valahiya” di lîteraturê de ye (eger tiştêkî wisa hebe!). Gelo îro pêwîstiya kurmancî bi “Rêber”êke wisa hebû, yên berê (ya Mustafa Aydoğan jî di nav de) bi kêrî çî nedihatîn, çî valahî hebûn di wan de, çî li wan hatiye zêdekirin? Û ya herî girîng; gelo çî pêwîstî bi “guherîn”ê hebû ku ev çend sal in pê tez, proje, gotarên akademîk hatine nivîsandin û bi xwe re û jixweberî tradîsyonek ava kiribû? Li vir pirseke din a girîng derdikeve meydanê ku ew jî ev e; ev *Rêber* li ser bingeha lêkolîna kîjan lîteraturê hatiye birêvebirin û kîjan valahiya di lîteraturê de dagirtiye? Ev yek jî divê bê/bihata nîşankirin. Lêbelê tiştê hatiye nivîsandin û dubarekirin ev e; “ji bo amadekirinê xebata Mustafa Aydoğan wek bingehê hatiye standin”. Gelo heta niha *tenê* xebata Mustafa Aydoğan heye/hebû? Beriya wê kurdan çawa dinivîsand gelo an jî li gorî çî dinivîsandin? Ev agahî jî di *Rêberê* de cih nagirin.<sup>19</sup>

Li aliyê din em binêrin bê avakerê elfabeya latînî ya kurdî û rastnivîsa kurmancî Celadet Bedirxan (divê navê Kamîran Bedirxan jî neyê jîbîrkin)- ku bi ti awayî di *Rêberê* de cih nagire!- sedemên pêdivîbûna elfabeyêke nû ya kurdî çawa aniye ziman:

"Di sala 1919'an de, me dabû çiyayen Meletyê. Em keti bûn nav eşîra Reşwan. Mêcer Nowel (îngilîzek) jî digel me bû. Micer zari nîvro dizanîbû, dixebitî ko hînî zari bakûr bibe û ji xwe re her tişt dinivîsandin. Min jî hin methelok, stran û çîrok ber hev dikirin. Carinan me li nivîsarên xwe çaven xwe digrandin, dixwendin û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer, bi bilivkirineke biyanî, li bê dijwarî destnivîsa xwe dixwend, li belê ez, heta ku min ( û ) ji (o) û (î) ji (ê) h.p. derdixistin, diketim ber hezar dijwarî. Ma ciman?.. Ji ber ko Mêcer bi herfen latînî, lê min bi herfen erebî dinivîsandin. Ser vê yekê, di cih de min qerara xwe da ji xwe re ji herfen latînî alfabekek lêkanî [pêk anî]" (...)

"Wekê em vegeyriyan hatin Stenbolê bi vê elfabeyê min kitêbeke elfabeyê û ferhengeke kiçik nivîsand û ji bona çapê kar kiri bûn. Lê mixabin ne ew elfabê, ne jî ew ferheng îro ne di destê min de ne. Di sala 1925 a de digel hin nivîsarên min ên din gehîştine heta pêşberê Mehkema Xarpûtê" (...)

"Sala 1924 a de, li Elmanyayê min careke din çavê xwe li elfabeya xwe gerand, hûr lê mêze kir û midekê xwe liser xebitim". (...)

"Ez paşê ji bi elfabeya xwe mijûl dibîm. Lê hetanî ko tirk elfabaya xwe belav kirin ya me weke xwe dima û tede me tiştêki bingehî ne diguhart. Min her tiştên xwe pê dinivîsandin û nasên xwe re dida zanîn." (...)

"Ji gotinên jorîn qenc xuya dibe ko elfabeya me paşîya xebateke sêzdehsalî e, gora zimanê kurdî, gora dengên zimanê me ye. Herê ev elfabê berî sêzdeh salan hatiye nivîsandin û gora zimên û dengên wî hîn bi hin edilî û ket halê xwe ê îro. Berî û piştî

<sup>19</sup> Hêja ye em li vir behsa xebata Özmen (2019) jî bikin ku sê rastnivîsên kurmancî bi hevdu re berawird kirine. Herweha, em ji xebata Özmen têdigihîjin ku heta niha derbarê rastnivîsê –rasterast an jî nerasterast- gelek xebat hatine kirin û berhem hatine weşandin. Ji bo danasîn, berawirdkirina û nirxandina wan berheman bnr. (Özmen, 2019: 11-21).



belavkirina elfabêyê min fikrên gelek kesan pirsin û gotinên hinekan bi kêrî min hatin. Di nav wan de mirovînen yekcar nexwenda jî hebûn. Ji lewra ez vê elfabêyê ji keda xwe bêtir keda miletê xwe dihesibînim û pêşkeşî wî dikim. Ji xwe herçî yê wî ye, ji yê herkesî hêjatrî û spehîtir e". (28 Çiriya Paşê, 1932, Şam).

Jegirtineke dirêj çêbû, lê ji serî heta dawî mebesta me diyar dike; yek, ji ber ku tê de, sosyolojiya ziman ango sosyolingûistîk heye; antropolojiya ziman heye; şewir heye û kêmilandin ango avakirina tradîsyonê heye. Xweş dide diyarkirin bê divê ji bo xebateke ziman (çi rastnivîs- çi jî aliyekî din) "rêbaz"eke çawa bê şopandin.

Du; ligel ku di ser re nêzî sed salan derbas bûye û gelek xebatên din jî hatine kirin; nêrîn û rêbaz di qadê de zêde bûne; gelek tecribeyên din jî derketine meydanê û tecribeyên gelên din jî wek mînak li pêşiya me ne; dîsa jî qet nebe em wê "rêbaz" a wî nayîn cih. Gelo em nikarin an em naxwazin?

Û sê; ligel van xalan hîna jî em xwe li nedîtîne dialiqîn! An jî li xwe danayîn ku navê wî di xebatên xwe de bi kar bînin ku ev yek bixwe hem ji aliyê "rêbaz"ê ve û hem jî ji aliyê "etîka zanistê" ve pirsgirêkeke mezin e.

Meseleyeke din a têkildarî metodolojiyê jî "tunebûn" a çavkanî ango referansan di *Rêberê* de ye. Wek li jor jî hatibû îfadekirin, lêgerînek an jî danasîna lîteraturê ango xebatên heyî yên derbarê mijarê di *Rêberê* de cih nagirin. Ligel tunebûna vê yekê, çavkaniyên din ên giştî jî di xebatê de cih nagirin.

Nîşandana çavkaniyan di xebateke zanistî de ji bo du tiştan girîng e; yek derfeta kontrolkirinê dide xwîner; du, tûrikê nivîskar dide xuyakirin; palpişt a îdîayên wî/ê/an xurt dike (an jî qels dike). Wekî din aliyekî vê nîşandayîna referansan bi etîka xebat û nivîsîna zanistî re jî heye bêguman. Ev rêgezêke esasî ye ji bo xebatên akademîk.<sup>20</sup> Lê gava mirov li *Rêberê* dinêre xuya dibe ku pabendî bi vê rêgezê nehatiye danîn. Tenê çend mînak dê ji bo mebesta me têrê bikin;

Di rûpelê 22an de sernavekî bi "qaîdeyên kîtekirin"ê heye û di bin de hatiye îfadekirin ku 2 (du) "prensîbên kîtekirinê" hene. Lêbelê tu referans nehatine dayîn da ku em bizanibin bê kê, li ku gotiye an nivîsandiye? Gelo ev qaîdeyên komxebatê ne, ji hêla endamên komxebatê ve hatine keşfîkirin? Gelo ev qaîdeyên giştî ne ji bo hemû zimanan an tenê qaîdeyên têkildarî kurmancî ne?

<sup>20</sup> Ev mijareke girîng e di xebatên zanistî de û derbarê wê jî gelek xebat dikarin bîn peydakirin. Wek mînak bnr: Bûlbûl (2004); İnci (2015).

Ev tenê wek mînakekê ye û ji bilî vê mînakê hinek hevokên din ên biûdîa hene ku pêwîstiya wan bi palpiştan, bi referansan heye. Hinek ji wan îdfiayan dikarin bo mînakê bîn destnîşankirin;

“...tîpa ducare, di morfemên kurmanciyê yên sade da tune ye” (r. 44). Çawa, li gorî kîjan xebatan, referans çî ne, nehatiye diyarkirin. Lê ji aliyê din ve Öpengin (2017:187) bi mînakan û referansên zimannasî hebûna wan diyar dike!

“...di hin devokên kurmanciyê de...” (r.148). Kîjan devok, li gorî kîjan çavkaniyan? Ev jî nehatiye nivîsandin!

“...awayê herî belav ew e ku...” (r.150). Li gorî kê an kîjan xebatên sehayî *herî belav*? Gelo derbarê vê xebateke berfireh heye? Bersivên van pirsan di *Rêberê* de tune ne!

Ev meseleya *herî belav* ku dîsa bûye mijara hinek rexneyan (bnr. Eroğlu) di hevpeyvînekê de jî derdikeve pêşiya me ku bi yek ji endamê komxebatê Bahoz Baran re hatiye kirin. Li ser pirsê Baran di nav bersiva xwe de îfadeyeke wisa bi kar tîne;

“*Mesela, di paşdaçekên “da” û “ra”yê da hem berbelavî dibe palpişt, (bi tenê hûn li bajarên kurmancîaxêv binêrin %80-85 bi “da” û “ra”yê ne)...*” (Mîtan 2019) (Kirpandin a min e). Li gorî kîjan xebatên sehayî û îstatîstîkî ev rêje derketiye meydanê? Gelo li ber destê komxebatê îstatîstîkeke wisa heye?

Bêguman di hevpeyvînekê de ev îfade dikarin ji bo xurtkirina nêrînekê bîn bikaranîn û dibe ku asayî be jî, lê gava ev şêwe bikeve nav vegotina xebatekê wê demê dibe pirsgirêk.

Lewma dema îfadeyên wekî; “...li gor hin devokan... li gor hin devokan...” (r.188); “...li hin welatan...” (r.189) di xebateke zanistî de hatin bikaranîn divê referansên wan jî bîn dayîn ji bo ku pirsên wek *kîjan devok, li ser bingeha kîjan xebatên sehayî, kîjan welatan* neyên kirin.

Herweha wekî ku ji van mînakan jî dikare bê dîtin, ne tenê ji aliyê sazkirina komxebatê, lêbelê ji aliyê karkirin û nivîsandina *Rêberê* ve jî pirsgirêkên rêbazê hene. Ji ber ku palpişt *Rêberê* ne daneyên nû ne ku ji sehayê hatine berhevkirin lê tenê xebateke heyî ye, gelekî asayî ye ku ji aliyê metodolojiyê ve jî hin pirsgirêkan vehewîne.

### Ji aliyê etîka zanistî ve *Rêber*

Wekî hat îfadekirin “tunebûn” an jî nişannekirina çavkaniyan bixwe têkildarî “etîk”a xebat û nivîsîna zanistî ye ku di *Rêberê* de nayê dîtin, ligel ku hemû endamên komxebatê jî xwedî pileyên akademîk in. Objektîfbûn, nîşandana çavkaniyan bi zelalî, vekirîbûn, dayîna agahiyên rast hinek mijarên têkildarî “etîk”a zanistî ne, bi taybetî jî di nivîsê de (Înci 2015). Mijarên ku di çarçoveya “ihlalkirina” etîka zanistî de tîn behskirin jî, hinekî bi yên jor ve têkildar, dikarin wek *întîhal (plagiarism)*, *întîhala xwe-bi-xwe (self-plagiarism)*, xapandin, *dubarekirin*, *nenîşankirina çavkaniyan* –ku ew jî rê li ber întîhal û dubarekirinê vedike- bîn îfadekirin.

*Rêber* ji vî alî ve jî hinek pirsgirêkan di nav xwe de dihevine. Wekî ku li jor jî hatibû îfadekirin ji bilî çend jêrenotan di xebatê de çavkanî nehatine nîşankirin, bi taybetî jî di mijarên teorîk de. Ev pirsgirêkeke sereke ya xebatê ye hem jî aliyê rêbaz û hem jî ji aliyê etîka zanistî ve.

Pirsgirêkeke din a girêdayî etîka zanistî jî ew e ku *Rêber* ji bilî çend xalan, dubarekirina xebateke heyî (duplication) ye. Ji bilî mînakan, li gelek cihan metin jî yek e. Nivîsandina "...û xebata wî ya bi navê ‘Rêbera Rastnivîsînê’ ji bo komxebatê bû bingeh” (*Rêber*, r. 14) a di beşa spasiyê de vê pirsgirêkê ji holê ranake, lê zêdetir dike û bêhtir derdixê pêş. Wê demê pirsên derbarê etîka “xebat”ê bixwe jî derdikevin meydanê! Gelo ji bo dubarekirina xebatekê pêwîstî bi civînên li bajarên cuda hebû?

Yeke din jî dikare di çarçoveya *plagiarismê* (întihal) de bê nirxandin ku ew jî dîsa têkildarî dubarekirinê ye. Tenê “pêşgotin” ji bo vê yekê bes e. Ji ber ku ji bilî her çar paragrafên dawî yên *Rêbera* Komxebatê, hemû pêşgotin peyv bi peyv ji ya Mustafa Aydoğan hatiye wergirtin, lêbelê di bine wê de “Komxebata Kurmancî” hatiye nivîsandin (*Rêber*, r. 18). Ev yek rasterast *plagiarism* (întihal) e û hebûna Mustafa Aydoğan di komxebatê de vê pirsgirêkê çareser nake, heta belkî zêde dike ji ber ku wê demê ne tenê *plagiarism*, lêbelê *self-plagiarism* jî dikeve nav niqaşê de. Ev yek di tevahiya *Rêberê* de derdikeve pêşiya me, ji ber ku li gelek deveran ji bilî mînakan, hevok jî rasterast yek in. Lewma ev jî tê wê wateyê ku komxebatê xebateke kesekî din wekî ya “xwe” nîşan daye û ev jî ji aliyê “etîk”a xebat û nivîsa zanistî ve ne guncav e.

Pirsgirêka sazkirina komxebatê li jor di nav mijara rêbazê de hatibû niqaşkirin; lê yeke din ku dikare di çarçoveya etîka zanistî de jî bê nirxandin, hayjêbûna (an jî hayjênebûn) endamên komxebatê ji “encam”ê an jî ji halê dawî yê weşandî û parastina fikrên di xebatê de ye. Hebûna

navên li ser xebatekê tê wê wateyê ku ew xebat ji hêla wan ve hatiye “nivîsandin”, rastî û xeletiyên xebatê yên wan in, ji encama xebatê jî haydar in û ji serî heya dawî berpîrsiyariya xebatê jî digirin ser milên xwe. Gava ku xwîner halê çapkîrî yê *Rêberê* dibîne û li navên li ser dinêre bêşik bi van hizran xebatê dixwîne an jî dinirxîne. Hussein jî di nivîsa xwe de balê dikişîne ser heman pîrsgirêkê û wisa dibêje;

Ji ber ku navê nêzikî 20 kesan li ser kitêbê heye, gelek xwandevaran bi xeletî wisa fehm kiriye ku kitêb wek encama şewirmendî û gotûbêjên berfireh di navbera wan kesan de hatiye amadekirin û wek encama yekdengiya wan hatiye belavkirin.<sup>21</sup>

Lêbelê, ji daxuyanî û peyamên vekirî û herweha yên ne *aşkerekirî* tê xuyakirin ku xebat ne “encam”eke li ser lihevkerî ye. Daxuyaniyên Deham Ebdulfettah û îfadeyên Dilawer Zeraq ne tenê vê pîrsgirêka etîk derdixînin meydanê, lê di heman demê de sitûnên xebatê jî ji binî ve ji holê radikin. Ebdulfettah di daxuyaniya xwe de wiha dibêje;

Sebaret bi geftûgokirina mijaran di civînên komxebatê da, min berî nuha gotibû ku gelek dengên endaman paşguh dibûn û yê min jî yek ji wan bû. Wê hingê diket gumana min ku lihevkirineke pêşînde li ser erêkirina hin mijarên aloz di navbera hin endaman da heye. Di wê rewşa komxebatê da min biryar wergirt ku ez beşdarîya xwe sivik bikim û paşê ez li her du civînên dawî (ya Mêrdîn a duwem û ya Stanbolê) amade nebûm. Hebûna navê min jî li ser *Rêberê* ne bi dilê min bû, lê weşanxaneya Wardozê ji min ra ragihand ku navê te pêşniyaza dostê te yê herî nêzî te bû, ne me ji ber xwe ve nivîsiye. Dema ku min ji dostê xwe pîrsî, çima ... Got: hebûna navê te giring bû ....

Ji peyama Dilawer Zeraq a li ser twitterê jî tê famkirin ku ew jî di hinek mijaran de ne ligel endamên din e û fikrên wî derbarê hinek xalan cuda ne. Ligel îtîrazên wî, navê wî jî wek endamê komxebatê û herweha amadekarê vê *Rêberê* xuya dibe.<sup>22</sup>

Ji aliyê din, Hussein Mohammed îdîa dike ku “...du kesên din di komxebatê de hebûne ku ne ligel encama rastnivîsê ne..” û wisa dewam dike;

Herwiha herdu kesên din yên ku navê wan li ser kitêbê ye û bi şexsî têkilî li gel min daniye, diyar kiriye ku ew di gelek mijarên nîqaşbar de ne alîgirên *Rêberê* ne, bi taybetî:  
nivîsîna -iy- wek -îy-  
çemandina lêkera ”hatin”  
nivîsîna paşdaçekên ”de, re” wek ”da, ra (Mohammed 2020).<sup>23</sup>

<sup>21</sup> Bnr. <https://zimannas.wordpress.com/2020/02/09/besen-pestir-besa-1-besa-2-besa-3-besa-4-besa-5-besa-6/> (lênêrîna dawî: 22.12.2022).

<sup>22</sup> Ji bo peyama Dilawer Zeraq bnr. <https://twitter.com/dilawerzeraq/status/1223147934885216256>

Ji van mînanan jî xuya dibe ku xebat ne li ser konsensusekê hatiye encamden û jê wêdetir têbiniyên wan kesan jî dîsa di xebatê de cih nagirin. Lewma hebûna navên wan kesan li ser xebatê ku têbiniyên wan hene û ji encamê ne razî ne wekî “xapandin”a xwîneran jî dikare bê nirxandin ku ew jî dikeve nav mijara îhlalkirina etîka zanistî.

Bêguman gelek pirsên wek ev rastnivîs dê li ku bê bikaranîn, gelo Wezaretê Perwerdehiyê ya Tirkiyeyê dê ji bo dersên kurdî vê rastnivîsê bipejîrîne; Bakur-Rojavayê Suriyeyê - ev gelekî girîng e ji ber ku îro bi awayekî fermî perwerdehiya kurmancî bi tîpên latînî lê tê kirin- çî dibêje, gelo ew jî vê rastnivîsê dipejîrînin, dê bi kar binin; têbinî û rexneyên wan çî ne, ew çî difikirin? ku bersiva wan nehatiye dayîn jî ji hêla metodolojî ve hinek pirsgirêkên din ên xebatê ne.

Lewma, wek dubare dikare bê gotin ku divê xebateke wisa heya bikaribe li ser beşdariyê berfireh pêk be. Beşdarbûna berfireh ji bo rakirina tevliheviyan ji holê, ji bo konsensuseke berfireh û ji bo “meşrûbûn”a (legitimacy) encamê jî dibe bingeheke bihêz. Ji bo vê yekê divê tecribeyên derdorê; yên gelên din bîn şopandin.<sup>24</sup> Eger derî li beşdarbûna berfireh bê girtin û di çarçoveyê teng de ev kar bîn kirin, wê demê di rewşa kurdî ya îroyîn de her yek dibe xwedî wî mafî ku li gorî xwendin, paşxane û zanînen xwe tiştêkî “nû” çêbike.<sup>25</sup>

Dîsa di rewşa îro ya kurdî/kurmancî de ku li gorî xebatên sehayî (û çavdêriyên giştî jî vê yekê dupat dikin!) her diçe rêjeya bikaranîna kêr dibe (Rawest 2020), xebatên tîn kirin divê rê nedin tevlihevîyê lê zelal bikin; bikaranîna zehmet nekin lê serê xwe biêşînin bê çawa bikaranîna ziman hêsantir û zêdetir bibe.

<sup>23</sup> Lêbelê Hussein Mohammed di nivîsa xwe de navê wan du kesên din aşkere nake.

<https://zimannas.wordpress.com/2020/02/09/besen-peştir-besa-1-besa-2-besa-3-besa-4-besa-5-besa-6/> (Lênêrîna dawî: 22.12.2022).

<sup>24</sup> Ligel ku ew qasî tê rexnekirin û niqaşkirin jî di warê “beşdarkirin”ê de tecribeya tirkî balkêş e. Sekretriya giştî ya Saziya Zimanê Tirkî (Türki Dil Kurumu) ji bo “kurultaya 3yemîn” bangewaziyekê di rojnameyan de diweşîne û dibêje kesên ku bixwazin dikarin hem wek endam, wek guhdarvan an jî bi “tez”ên xwe beşdarî vê komcivînê bibin. (Bnr. Açiksöz, 1 Temmuz 1936).

<sup>25</sup> Wekî mînak, hunermendê kurd Şêxo ku ji herêma Mereş/Gimjimê ye û ji 1978an ve li Almanyayê dijî û ji wê demê ve stranên kurdî/kurmancî dibêje, îdîa dike ku elfabeya kurdî têra bilêvkirina devoka wê herêmê nake û divê hinek tîpên din (wek ó û ú) li ser bîn zêdekirin û wan tîpan di albûmên xwe yên dawî de jî bi kar tîne. (Bnr. <https://www.youtube.com/watch?v=c5S1Syarypw>). Eger “standartkirin” ne bi konsensusekê hatibe saz kirin, dê kî, çawa, li ser kîjan bingehan bikaribe, wekî mînak, Şêxo îkna bike ku ew bixwe kurdî, almanî, îngilîzî jî dizane û li gorî xwe lêkolînen derbarê ziman jî kirine!

## Encam

Standartkirina zimanekî an jî zelalkirina xalên rastnivîsê ji bo pêşxistina zimanekî girîng e, lê bi qasî vê yekê rêbaza ku tê şopandin jî girîng e. Dubarekirin, hebûna întîhalê an jî întîhala xwe-bi-xwe, hayjênebûna endamên komxebatê ji encamê û herweha neligelbûna endamên komxebatê ligel hinek mijarên *Rêberê*, xebata bi navê “Rêbera Rastnivîsînê” hem ji aliyê metodolojiyê ve û hem jî ji aliyê etîka xebat û nivîsîna zanistî ve qels dike. Ji ber van mijaran e ku rexneyên tûj lê hatine kirin û tên kirin jî.

Ji aliyê din ve hem sazkirin hem jî encama komxebatê – *Rêber*- bixwe dide xuyakirin bê xebateke bi vî rengî divê çawa bê birêvebirin, rêbazeke çawa bê meşandin, çi li ber çavan be girtin.

Zimanek (an jî rastnivîsa zimanekî) çawa tê standardîzekirin? Divê çi li ber çavan bîn girtin? Ji ezmûnên heyî tê xuyakirin ku; an ji jor ve, bi hêza saziyekê ku navê wê dewlet e; an jî ji jêr ve, bi lihevhatineke berfireh. Eger her du jî tune bin, “dem” bixwe dihêle ziman, ji nav xebat, niqaş û bikaranîn heyî, tradîsyona xwe ava bike, biguherîne, xwe ji nû ve saz bike.<sup>26</sup>

Rewşa kurdî (ango di mînaka me de zaravayê kurmancî) ya îro, ji ber ku dewletek an jî saziyeke “temsîlkar” tune ye; an dê bi lihevkirineke berfireh ev kar bê kirin an jî ji demê re bê hiştin ku tradîsyonekê ava bike. Eger ew konsensûs tune be wê demê rê li ber wê yekê vedibe ku her yek an jî kom dikare li gorî xwe/devoka xwe/nêrîna xwe rastnivîsa xwe çêbike.

Eger bê dubarekirin, tu guman derbarê “nêta baş” a komxebatê û kesên tê de cih girtine tune ye. Lê ev nayê wê wateyê ku her encama karekî bi nêteke baş dest pê kiriye jî dê “baş” be. Wekî ji rexne û têbiniyan jî diyar dibe; encama vî karê “Rastnivîsîna Kurmanciyê” ku bi nêteke baş hatiye destpêkirin di dawiyê de tevliheviyek jî bi xwe re aniye û xuya dibe ku wê dewam bike û ji bo pêşeroja zimanê kurdî jî dê ne baş be.

Lewma wek gotina dawî dikare bê gotin ku di rewşa îro de pirsgirêka sereke ya kurdî/kurmancî ne “rastkirin” e, lêbelê berfirehkirina bikaranîna ziman e. Ji ber ku li gorî hinek xebatên sehayî yên nû rêjeya bikaranîna kurdî/kurmancî her diçe kêmtir dibe. Encama “rastkirin”êke bê lihevkirineke giştî jî tevlihevî û bandoreke neyînî ye li ser bikaranîna ziman.

<sup>26</sup> Ev nayê wê wateyê ku dê xebat neyên kirin. Bêgûman di vê maweyêde dê ceribandin çêbibin, dê xebat bîn meşandin, bîn pêşniyazkirin û dibin jî, lê hevî ew e ku bêyî şeweyeke liserferzkirinê ev xebat di çarçoveyê zanistî de bîn kirin û rêgezên etîk ê zanistê li ber çavan bigirin.

## Çavkanî

- Açıksöz (Rojname), 1 Temmuz 1936.
- Aktuğ, Halil (2017). Komxebata Kurmancî û Rêbera Rastnivîsê. *Kanîzar*, hj.14, r. 13-59.
- Alan, Remezan (2019). Hîleya întihalekê. Kovara BÎR. <http://kovarabir.com/remezan-alan-hileya-intihaleke/> (Lênêrîna dawî: 22.12.2022)
- Aydın, Tahirhan (2020). Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmancîyê (nirxandina pirtûkan). *Kurdîname*, hj. 3, r. 138-142. <https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiname/issue/57977/833215>
- Aydoğan, Mustafa (2012). *Rêbera Rastnivîsînê*. Rûpel: İstanbul
- Bedirxan, Celadet Ali (1932). *Rûpêlinen Elfabeyê*. Weşanên Hawar; Şam
- Bülbül, Tuncer (2004). Bilimsel Yayınlarda Etik. *Pamukkale Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*. c. 15, hj. 15, r. 53-61. <https://dergipark.org.tr/tr/pub/pauefd/issue/11128/133081>
- Ebdulfettah, Deham (2020). Daxuyaniyek derbarê rêbera Rastnivîsînê da. <http://portal.netewe.com/daxuyaniyek-di-derbare-rebera-rastnivisine-da/?fbclid=IwAR0LpAfo4Caojg9M8bwInGH82myLR1HNyCt6JId3DXpZuPHkgkKZUKb8sLQ> (Lênêrîna dawî: 26.07.2022).
- Ergin Öpengin (2017). Pirsên Rênivîsa Kurmancî: Pêdaçûneke Rexneyî li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydoğan. *Derwaze*, hj. 1, r. 180-195.
- Eroğlu, Yusuf (2019). Rêbera Rastnivîsînê Çi Rast Nivîsiye?. *Nûbihar*, cild. 23, Hj. 149. (Nivîs li ser malpera Diyarnameyê jî dikare bê xwendin: <https://diyarname.com/news.php?Idx=39457> (Lênêrîna dawî: 23.03.2022).
- Eroğlu, Yusuf (2020). “Rastnivîsîn (?): Otorîte yan otorîterî?”. <https://rojnameyawelat2.com/rastnivisin-otorite-ya-otoriteri/> (lênêrîna dawî: 23.03.2022).
- İnci, Osman (2015). Bilimsel Yayın Etiği. *Türk Kütüphaneciliği*, cild/hejmar: 29/ 2 (2015), r. 282-295.
- Keskin, Necat (2018). Rewşa Akademiya Kurdî Li Tirkîyeyê û Pirsgerêkên wê-Türkiyede Kürtçe Akdeminin Durumu ve Sorunları. *Şarkiyat* 10 / 1 (Nisan 2018): 471-485. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.370336>
- Mîtan, Ferîd (2019). Derbarê “Rêbera Rastnivîsînê” de... (Hevpeyvîn bi Bahzo Baran re). <https://krd.riataza.com/2019/04/15/der-bare-rebera-rastnivisine-de/> (Lênêrîna dawî: 26.07.2022).
- Muhammed, Husein (2020). “Rêbera Rastnivîsînê” ya WM û derdê giran yê hîperkorektîyê û xweferzkirinê. <https://zimannas.wordpress.com/2020/01/29/rebera-rastnivisine-ya-wm-u-derde-giran-ye-hiperkorektive-u-xweferzkirine-1/> (Ev rêzenivîs ji 8 nivîsan pêk tê û hemû ji bi hevdu ve girêdayî li ser heman malperê dikarin bîn dîtin/xwendin).
- Orak Reşitoğlu, Sevda (2022). Berawirdkirina Kovara Hawarê û Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmancîyê ji Aliyê Rastnivîsînê ve. *Folklor û Ziman*, c.3, hj. 1, r. 85-119. <https://dergipark.org.tr/tr/pub/folklorziman/issue/70515/1102396>
- Özmen, Abdulsittar (2019). *Berawirdkirina Sê Berhemên Rastnivîsîna Kurmancî (Bingehên Rastnivîsîna Kurdîyê ya Arîf Zêrevan –Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydoğan- Rêbera*

- Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmanciyê*. Mêrdîn: Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî li Tirkîyeyê (Teza masterê ya neçapkirî- Şew. Doç. Dr. Mustafa Öztürk).
- Rawest (2020). “Ebeveyn ve çocuk arasında ana dilin durumu | Araştırma bulguları”. <https://rawest.com.tr/ebeveyn-ve-cocuk-arasinda-ana-dilin-durumu/> (23.03.2022).
- Komxebata Kurmanciyê (2019). *Rêbera Rastnivîsînê*. Çapa yekem. Weşanên Weqfa Mezopotamya: Diyarbekir
- Xelîlî, Qasimê (2020). 6 rexne li “Rêbera Rastnivîsînê”. <https://zimannas.wordpress.com/2020/02/12/6-rexne-li-rebera-rastnivisine/> (Lênerîna dawî: 24.03.2022).